

LI PEY ŞOPA BAV Ê KALAN

ÇANDNAME

E-KOVARA ÇAND Ê JIYANÊ - GULAN 2020



**NAMEYEK
DERENGMAYÎ**

Mela Mihyedîn

**FAYDEYÊN KOMÊN
XWENDINÊ ÇI NE?**

Hevpeyvîn:
Ayetullah Badikî

**ÇEND
DERÛNNASÊN
HERÎ NAVDAR**

Metin Eser

ÇANDNAME

e-Kovara Çanda Kurdî
Jimar 2 • Gulan 2020

Xwedî
Firat Bawerî

Edîtorya
Paşa Amedî
Ridwan Xelîl

Kontrola Nivîsan
Amed Hesên

Navnîşan Malperê
www.candname.com
candname1@gmail.com

Navnîşana Kovarê
candnamekovar@gmail.com

Nivîskar ji nivîsên xwe,
Xwendevan jî ji xwendina xwe
berpirs in. Lijneya kovarê dikare li
ser nivîsan serastkirin û guherîna
çêbike. Her nivîsa ku hatiye şandin
dibê ku newê weşandin.

 Çandname

 CandnameCom

 Çandname TV

BI HEJMAREK NÛ JI WE RE MERHEBA

Xwendevanên delal û bi rûmet! Ewîlî em lêborînê ji we dixwazin û dibêjin li me biborin ji ber hinek sedeman em pir dereng man. Lê şîkur ku va ye bi hejmera 2yem em dîsa bi we re ne.

Niha çanda Kurdî û xebatên zimanê Kurdî tev bi dildariyê bi rêve diçin û didome, Xweda van kesên dildar kêm neke inşallah. Ku ne ji vê dildariya Kurdî be, tu kes û rêxistin bi rêve nadibir û çanda kurdî nedigihîşt vê astê. Çimkî xebatên Kurdî niha tev bi dildariyê tên holê. Ji ber vê em hemû dildarên ziman û çanda Kurdî re silav dîkin. Her dildar hêja ye û bi qedr e.

Kovara me jî bi dildarî bi rêve diçe û ji hêla zimanhezan ve nivîs amade dibin û ji me re dişînin em jî cih didin nivîsên wan. Her kes li gorî xwe li Kurdî xwedî derdikeve ev berhem tên holê û dibe kovara dijîtal. Em spasîyên xwe pêşkeşî wan dîkin.

Wekî hûn zanin şevba/çora Koronayê li seranserê cihanê belav bûye û didome. Xwedê Te'ala ji mirovan re bike sedema îmtîhanan, derswergirtinê û pêşketinê. Ji vê nexweşiyê jî xuya dibe ku mirov tev mihtacê hev in, tu kes bêhev nikare bijî çimkî mirov zîndewarêkî civakî ye û jiyan hevpar e. Ji ber ku mirov bijî û jiyan xwe berdewam bike hewce ye ku nan bixwe; diçe ji firinê nan dikire, firinvan jî febrîqê arvan dikire, febrîqê jî ji cotkaran genim dikire...her xîzmet her tişt weka zincîrê girêdayî hev in. Ji bo van sedeman her kes, her yek an her civat muhtacê hev in. Ji ber ku mirov civakî ye, kes nikare bibêje ez ser bi xwe me. Ez tevî civakê nabim. Yê ku tevî civakê nebe jixwe rehetiya dinyayê nabîne.

Çawa ku mirovên cihanê li ber şevba Koronayê di xeterê de ne. Zimanê Kurdî jî niha li ber xeterê ye. Zimanê Kurdî bi tev zaravayên xwe zimanê her Kurdekî ye. Divê her Kurd bibe xulamê zimanê xwe û ji bo zimanê xwe bişxule û zimanê xwe li her der û qadan de bi bikar bîne; li ziman û çanda xwe xwedî derkeve. Ziman jî di civakê de têkiliyan bi hev re çê dike û jiyan pê dewam dibe. Ku ne ji ziman be mirov ji hev nikare fehm bike, ku fehmkirin tunebe hezkirin jî çê nabe. Ziman sedema têkiliyê ye û mirov bi saya ziman ji hev hez dike.

Di vê meha rehmetê de du cejn tene pîroz kirin; yek ya olî Eyda Remezanê, ya din Cejna Zimanê Kurdî; wekî herkes dizane her 15ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî ye û her sal tê pîroz kirin. Cejna Zimanê Kurdî ji sala 2006an vir de bûye Roja Zimanê Kurdî. 15ê Gulanê roja destpêka weşana kovara Hawarê ye. Kovara Hawarê di dîroka Kurdan de cihêkî taybet digire.

Bi van sedeman em Roja Cejna Zimanê Kurdî ya we pîroz dîkin. Cejna Remazanê jî ji we û gelê me re û ji alema Îslamê re bixêr û pîroz be.

Heya hejmarek din bimînin di nav xêr û xweşiyê de. Em li benda nivîsên we ne bo hejmara sêyem.

NAVEROK

4 MERHEBA

Ersin TEK

8 DENG, DEM Û QEWM

Krîstîn ÖZBEY

10 NAMEYEK DERENGMAÛ

Mela MIHYEDÎN

12 ÇEND GOTIN

Anonîm

13 ÊŞA PIŞT Û QORIKÊ

Dr. Yahya Kemal BURKAN

15 SEBZEYÊN HERÎ KÊMKALORÎ

Anonîm

16 DI SERDEMA DIJÎTAL DE DEMA
E-WEŞANAN DIYAR DIBE

Ridwan XELÎL

20 MEJÎ

Kurê REŞÎD

25 ÇEND PIRTÛK

Reklam

26 ÇEND DERÛNASÊN
HERÎ NAVDAR

Metîn ESER

33 YAN ZIMAN YAN GORÎSTAN

Anonîm

34 TÊKILÎ JI RÊZIKAN
GIRÎNGTIR IN

Ahmet Subaşı - Harun Delîkaya

39 FEYDEYÊN KOMÊN
XWENDINÊ ÇI NE?

Hevpeyvîn: Ayetullah BADIKÎ

42 ÇEND PÊKENOK

Zinarê XEMO

44 EZ DIXWAZIM BI VÊ
NAMEYÊ...

Abdurrahman AYDOĞDU

46 DI 'ADAT Û RUSÛMATNAMEÊ
TEWAYIFÊ EKRADIYE DE JINA
KURD

Medenî ÖĞÜT

55 GIZÊ GAZO

Şems Yusuf DERDERE

56 TASEK AV

Paşa AMEDÎ

58 JI BO RASTIYA ZIMÊN

Firat Bawerî

MERHEBA

ERSÎN TEK

"Ev çîrok ya te ye, tu çî dikenî?" (Horatîus)

Beriya ku ez dest bi nivîsê bikim, dixwazim pêşî bi merheba û spasiyekê dest pê bikim.

Merheba ji bo we xwendevanên ezîz û bi rûmet. Hîvîdarim ku em bi hev re li ser zimanê xwe yê şîrîn û dewlemend şîrove û rexneyên bi bingeş, têr û tijî li vir bikin û em jî kedeke xwe biêxin nav ziman û edebiyata Kurdî.

Bi taybet serkeftinê ji bo Kovara Çandnameyê dixwazim û spasiyek ji dil û can ji wan dikim ku derfeta nivîsandinê daye min û îro li vir bi zimanê xwe yê zikmakî û şîrîn ve li pêşberî we xwînerên hêja û birûmet dinivîsim.

Heke min şîya ku di wijdana we xwendevanên ezîz de deng vedim û ji bo pêşerojê peyvekê jî bihêlim, ez ê pir dilşad û bextewar bim. Mijara ku ez ê li vir binivîsim û li ser şîrove û rexnegariyê bikim, ji aliyê rexnegariyê ve, bi taybetî ez xwe bi xwe rexne dikim û bi giştî jî ev rexne ji bo me teva ye..

Hundî ku wêvetir e, gelê Kurd di warê çand, huner, dîrok û edebiyatê de xwe bispor dike û bi vê minasebetê jî giringî û dewlemendiya zimanê xwe yê zikmakî çêtir fehm dike û wek Seydayê Xanî dibêje, dewlemendiya "durra" zimanê Kurdî û Wêjeya Kurdî baştir fêhm dike.

Bi taybetî di van demên dawî de, bi zêdebûna xwendevan û nivîskarên Kurd ve gelek malper, kovar û blog, ku bi Kurdî weşanê dikin derketine holê û ji bona pêşveçûna ziman û edebiyata Kurdî derfetek pir hêja û xwedî rûmet e.

Ev yeke jî nîşaneyeke wisa ye ku dilê me hemû Kurd û Kurdistanîyan xweş û geş dike.

Wextê ku mirovî bi çavek zimanzanî û rexnegariyek ilmî ve; ev mijar û babeta nivîsandina Kurdî şîrove û mêze kir çend xalên girîng derdikevine holê û ev tiştene jî dilê mirovî pir dişewitînin û xemgîniyekê derdixîne holê. Ji ber vê yekê jî barekî giran dikeve ser milê nivîskar, edîtorên kovar û malperan.

Divê ev kesên ha, bi awayek baldarî li ser zimanê nivîskaran rawestî û şaşî û kêmasiyên di warê rêziman û rastnivîsa Kurdî de tespît bikin û bi awayek mentiqê zimanê Kurdî li ser wan bifikirin, kêmasî û xeletiyên ku di hişmendiya Kurdî de hatine kirin, bi hizrîna mejiyek kurdevar ve bêne sererastkirin. Çimkî piraniya rewşenbîr û nivîskarên Kurd, exleb ewên li bakur, di dibistanên Tirkan de yê hatine perwerdekirin û hê jî perwerdebûna wan berdewam e, mejiyê wan bi awayê Tirkî di şuxule. Ji ber ku zimanê wan ê xwendin û nivîsandinê Tirkî ye. Ji ber vê sedemê jî mijarên razber û teorîk, meseleyên ku ji kitêban hîn dibin di mejiyê wan de bi Tirkî bi cih dibin.

Ew ên ku di dibistanên Tirkan de perwerde û hindekariyên xwe bi zimanê Tirkî kirine, bivê û nevêtin bi awayekî neyînî têra xwe di bin bandora zimanê Tirkî de dimînin.

Ango em bi fikr, hizr û ramanên xwe ve bi giştî di bin tesîra Tirkî de dimînin. Em ê hatine halekî wisa ku bêyî hemdê xwe em bi Tirkî difikirîn, dihizirîn û bi Kurdî di peyivîn û dinivîsîn.

Bi kurtasî, niha jî dema ku em nivîsên akademîk û teorîk bi zimanê xwe dinivîsin em gelek zehmetiyan dikişînin. Divê em hêdî hêdî bi awayekî sistematîk û zanistî li pey bersivên van pirs û pirsgerêkan bikevin, bersiv û çareseriyekê ji bo van peyda bikin.

Ji aliyê din ve, wekî ku Kurdolog û zimanzanên ku li ser Kurdan lêkolîn kirin; yê diyar kirin ku ziman, wêje û çanda Kurdî gelek qedîm, dewlemend û kevnare ye. Netewê Kurd li Rojhilata Navîn neteweyekî herî kevnar, qedîm û xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Him jî ber vê heqîqetê, him jî ber pêşketinên serdema ku em tê de ne û him jî ji ber rewşa xweser a civaka Kurd, bi hezaran mesele û mijar hene ku divê rewşenbîr û nivîskarên Kurd li ser bisekinin, nîqaş û rexneriyên ilmî bikin.




Her wiha mirov bixwaze ku nivîsa mirovî ji aliyê xwendevanan ve bête pejirandin; pir girîng û pêwîste ku mirov naveroka nivîsa xwe, ji mîrata milletê xwe wergire û bi wê mîrateyê ve vehîne û bixemlîne û danîte ser sifra xwendevan û rexnegeran.

Ligel vê yekê heger mirov qala astengên li pêşiya Kurdan û zimanê Kurdî bike, ew jî pir in. Lê belê ez di xwe re nabînim ku li ser van xalan rawestim û yek bi yek şîrove û rexne bikim. Bi qasî ku ez dişopînim rewşenbîrên Kurd, ji mêj de ye ku xwe ji nîqaşên teorîk dane paş û bêhtir li ser mijar û babetên rojane radiwestin. Lê belê ji her tiştî muhimtir ew e ku em bêhtir li ser van babet û mijaran bi sekinîn, rexne û şîroveyên xwe di vî warî de bikin. Çimkî gelek pirsên ku milletên din bi sedan salan beriya niha ji wan re bersiv ditîne, eve ne bi awayekî herî beyar hêj yên li hemberî me disekin û çareseriyekê ji me daxwazdiken.. Ji ber vê yekê ye ku ev tiştên tene nîqaşkirin, bandoreke gelek mezin li ser çarenûs û paşeroja me dikan.

Tiştêkî din jî heye û divê ez wê jî eseh bibêjim:

Pêwîste ku em ji bîr nekin îro li bakurê welêt ji sedî 80yê Kurdan, ditirsin bi Kurdî bixwînin, binivîsin û bi peyîvin; ji ber tirsê ku Kurdiya wan têrê nake. Ev kesên wisa gava ku dixwînin ji xwendinê fêr nakin. Pêwîste ku em rêyekî li ber yên ku di vê rewşê dene vekin ku ne tirsin û bêne astek wisa ku ji zimanê dayika xwe hez bikin. Bi zimanê xwe bawer bikin û jiyana xwe bi zimanê xwe bimeşînin.

Divê em bi giştî li yek û du xwedî derkevin û piştevaniya hev bikin da ku xwendin û nivîsandina Kurdî berdewam û dewlementir û zêde bibe. Bi vî awayî da gelê Kurd jî hêdî hêdî bikaribin bigihîjin merheleyeke şaristaniya nûjen.





Ji ber vê yekê pêwîste ew kesên ku, hindik be jî, bi zimanê Kurdî re têkildar û eleqedar in, lazim e ku zimanê Kurdî modernîze bikin yan jî zimanekî standart çêbikin. Ji ber hindê jî divê beriya her tiştî di nivîsandinê de em zimanekî standart ava bikin. Zimanekî yekgirtî ku her kes bikaribe jê fêhm bike. Di destpêkê de ev bêguman zehmet e.

Çimkî bi zimanê Kurdî perwerde tune, mirov bi kurdiya ku dizane dest pê dike. Ev jî normal e. Lê divê hedef û armanca me ew be ku em xwe bigihînin zimanekî standart.

Tiştêkî din jî, diyar bikim; ez ne zimanzan im. Lê ez jî li ser vê mijarê di nav van bîr û baweriyên de me û wisa difikirim. Dibe ku şaşitî û kêmasiyên min jî di vê mijarê de pir bin...

Bi izna Xwedê Te'ala me dest pê kir. Xebat ji me, qûwet û serkeftin jî ji Xwedayê Mêhrîban e.

Dibêjim heta hejmareke din spartiyê Xweda bin. Bimînin di xêr û xweşiyê de.

Ersin Tek / Wan

DENG, DEM Û QEWM

KRÎSTÎN OZBEY - QRÎSTÎN11@HOTMAIL.COM

Li ber paceya xwe ya
payîzî rûniştîme dîsa



Li ber paceya xwe ya payîzî rûniştîme dîsa. Ev çendikûçend roj in xwezilahiya xwe bi mirovên bi rihetî dimeşin tînim û li derve temaşê dikim. Meşa kulî kulî çî zor e gidî. Mirov dimeşin, bêyî ku bi qîmeta wê bizanibin. Jixwe em hemû newsanin; heya ku nekevin binê darê sihetê (sihet ji dest neçe) em bi xwe nahesin. Di kaş û berkaşên jiyanê de carna mirov poşmaniya rika xwe ya pêkanîna tiştên di ser hêza xwe de dijî.


Dengê nalîna êşên kûr dibe dengê poşmaniyê. Carbicar xweza bala min dikêşe ser xwe. Dibêje ez jî li vir im.

Dema şerê ba/baran û pelan e. Lê ne şerekî wek yê mirova ye. Wek dansekê ku her sal di demekê de qewlê xwe datînin û şerekî şêrîn dikin e. Dengê ba û baranê jî muzîkên fonê ne û olan didin.

Lorena Mc Kennet distire di radyoyê de. Dengê wê û dengê enstrumanên wê qewmê Kelt tîne bîra min. Te dî muzîk wek makîneya demê ye. Te bi xwe re dibe û hey dibe. Ew qewmê ku ewqas şervan, egîd, jêhatî û bi orf edetên xwe ve girêdayî niha wenda ne lê ji wan gelek tişt mane heya îro. Yek jê jî muzîka wan e ku hemû dinya lê guhdar dike. Dinya ye, tije hatin û çûyîn e, çî zû çî dereng, çî bi wext çî bêwext.

Hin qewm hene ku li ser pişta hespa, bê şaristanî û tim bi hovîtiya xwe hebûna xwe domandine hatine heta îrohîn. Di kuderê de derbas bûne talan kirine û xwe kirine xwediyê çanda wan cihên talankirî. Bi siyaset, dek û dolaban tim biserketine. Dema ku tîen bîra mirovahiyê, dengê nalên hespên şer, dengê şirqesirqa şûra dikeve guhan. Herî dawî bi muzîkê tîen bîra mirovahiyê. Muzîk jî tê de, diziya wan a di her warî de navdar e. Bifikirin ku muzîka qewmekî didizin, jî xwe re dikin sirûd û li heman qewmî îşkence dikin. Dema li muzîkên dinyayê guhdar dikim dibînim ku qewmê Romê jî her derê dinyayê diziye kiriye û wek ya xwe daye zanîn. Ji viya re dibêjin diziya profesyonelî. Hunermendên wan ên herî navdar gelek gelek diziya kirine. Nivîskar, muzîkjen, hunermend û gelek gelek kes.

Hin qewm jî hene ku heta îro kê çî kiriye wînda nebûne. Li hemû dinyayê belav bûne lê dîsa jî wînda nebûne. Deng bi deng xwe gîhandine heya van rojên hanê.



Destanên xwe, şer, pevçûn, serkeftin, êş, kêf û şahiyên xwe jî bo hebûnê di qirik û gewriya xwe de veşartine. Kengî dema wan hatiye bê enstruman be jî sitranên xwe gotine.

Di van demên dawî de dengêkî pir tesîr li min dike. Mem Ararat, bi sitran, enstruman û dengê xwe pireyekê di nav paşeroj û pêşeroja me de datîne. Geh "lorîka Cemîlayê" dilorîne, geh "dil disoj-în-e", geh bi "bûka baranê" gazî yarê dike û geh bi "strana bédengiyê" dengê dilê dayîkeke kezebşewitî li dinyayê belav dike.

Carna dengêkî jî min re dibêje ku serkeftina şer bi afirandin û gotina stranên bedew bûya teqez wê Kurd di tu şerî de tîkneçûna. Lê çî heyf ku jî beriya berê heya îro qanûnê dinyayê li ser tundî û şer ava bûne.

NAMEYEK DERENG MAYÎ

Mela Mihyedîn - mihyedîn@outlook.com



**Belê rast e çi bê gotin bê
feyde ye û çi bê gotin bê
wate ye.**

Belê rast e çi bê gotin bê feyde ye û çi bê gotin bê wate ye.
Hertişt di cihê xwe de û di wextê xwe de xweş e.

Her demek, her kêlikek, her hevalek û her fikir û raman
pîroz in. Her yek ji wana rêça jîyana me diguherînin. Bi saya
wan, an em serdikevin an jî em bindikevin. Di vir de a ku
qedera me dîyar dike ew kêlik û tercîhên me ne.

Wekî xwarinek xweş; hin caran hin kes tamek xweş û
berîkirinek dijwar li pey xwe dihêlin. Hin caran jî hin kes
tamek tirş û tal li dû xwe dihêlin ku meriv jî îmanê derdixin.
Lê çi bi wî û çi bi vî rengî be jî jîyan, me mirovên di nav
çerxa xwe de hûr hûr dike.

Gellek caran berîkirinên dijwar bi qirika însanan digirin û
nahêlin bi rihetî wê dema xwe biborînin.

Gellek caran ew berîkirinên berê, jîyana îroyîn serobino
dikin û li şûna xwe jîyanek tarûmar dihêlin.

Lê çiqas berîkirin vegerê bîne bêriya mirovan jî vegerêdî
nehêsane.

Veger nehêsane êdî, jîyan tirş û tal e lê li gel wê talîya jîyanê jî jîyan berdewam e.


Wekî Heraklîtos gotî: "Tiştekek wek berê namîne û bêgûman her tişt diguhere". Ew jîyana me li dû xwe hiştî, ew salên me li dû xwe hiştin, ew bajarên me li dû xwe hiştin, ew hevalên me li dû xwe hiştin û ew yarên me li dû xwe hiştin... Her tiştekek û her kesek ji ser heta pîyan hatine guhertin û em jî pê re.

Êdî ew bajarê ku me jê hez dikir ne ew bajêrê berê ye. Ew salên me li pey xwe hiştin êdî bûne dîrok û bîranîn. Ew heval û yarên me li pey xwe hiştin êdî ne ew kesên berê ne. Mejîyê me di derbarê wan de bîranînên xweş qeyd kirine. Hemû tev ji xeyalek û ji bîranînekê pêk tên. Ya ku mirîyan zindî dike û wan jî nû ve radike bîranînên di mejîyê me de ne lê di rastiyê de hemû mirîne.

Êdî em û bajarên xwe yê nû, em û emrê xwe yê nû, em û hevalên xwe yê nû, em û yarê/a xwe yê/a nû divê em li hev bikin û divê em li pey bêrîkirinên berê nekevin ku em ne jîyana xwe û ne jî jîyana wan biherimîn.

Bêrîkirin çendîn caran dişwar bin jî û çendîn sal bi sal xwezî bi par bin jî êdî veger tune.

Gava ku derfet ket destên me divê meriv wê derfetê ji destên xwe bernede.



**Gava ku
derfet ket
destên me
divê meriv
wê derfetê ji
destên xwe
bernede.**

ÇEND GOTIN



AMIR HASSANPOUR

Ziman ewqasî semboleke hêzdar a
neteweyî ye ku, qedexekirina fermî ya ji
bo bikaranîna wî, pirr ê caran dibe
sedema bingeîn a zîndewerîya wî.



CELADET ALÎ BEDIRXAN

Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê
cihê têne
daqurtandin.
Ko gihane hev dibin lehî, lehîke boş.
Tu
kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata
welatê me di rabûna vê lehiyê de ye.



FRIEDRICH ENGELS

Daneheva sermîyan mîna
vexwarina ava şor e. Çiqas
vedixwî tî dibî, çiqas tî dibî dîsa
vedixwî. Bi kurtasî pençeşêreke
bêdawî ye.

KONFÎCYUS

Li deverêkê dema siya mirov ji
mirov dirêjtir (mezintir) be, bizane ku
li wê derê roj li ber ava ye.



SAÎDÊ KURDÎ

Ez dikarim bê nan bijîm,
lê ez nikarim bê azadî bijîm.



MEM ARARAT

Li bajarê me serê vê êvara
Heyvek nû hilat li dilê vala
Dilerize tu, dibişire tu
Ne ji te be heyvê wê şev çawa ba?

ÊŞA PIŞT Û QORIKÊ

TENDURISTIYA PIŞTÊ

Gelo em çawa xwe biparêzin?

Nexweşiya AnkîlîzanSpondîlît nexweşiyekî bi êş e û li ser mazmazka we bandorekî romantîzal çêdike. Her wiha ev nexweşî carna ji aliyê gel ve wekî fitîqa piştê tê binavkirin. Lê belê ev nexweşî ne fitîqa piştê ye.

Ji ber wî jî teşhîskirina vî nexweşiyê pirî caran 8 salan jî berdewam dike. Ji bilî wî jî aliyê doktoran ve ev nexweşî hin caran bi şaşî wekî fitîqa piştê tê dîtin

Li ser nexweşiya AnkîlîzanSpondîlît de Dr. Yahya Kemal Burkan ku niha li Nexweşxaneyê Memorîalê ya Amedê di beşa Rehabîlîtasyon û Tedawiya Fîzîkê de dimîne ev agahî dan: "Ev nexweşî bi piranî di temenê 20 salî de derdikive û bi piranî di zilaman de derdikeve pêş. Heger tedawiya nexweşiyê neyê kirin, li ser rewşa kesê nexweş bandorekî psîkolojîk jî çêdike. Ji ber wî jî kesên ku pişt û qorikên wan biêşên divê teqez serî li doktoran bidin."





Rê û rêbazên parastina ji nexweşiya
AnkîlîzanSpondîlît:

- Cihê ku hûn li serê radikevin divê hişk be lê divê we bêhuzûr neke.
- Divê bi awayekî ahengdar xwarin bê xwarin û cixare jî neyê kişandin.
- Divê her tim mazmazkê mirovan bixebite û tu carî korse neyê bikaranîn.
- Divê kesên nexweş rojê 20 deqe serpiştî yan jî serdevkî xwe dirêj bikin û divê mirov dema rakeve xwe nekişîne hev.



Divê kesên nexweş rojê 20 deqe serpiştî yan jî serdevkî xwe dirêj bikin û divê mirov dema rakeve xwe nekişîne hev

SEWZEYÊN HERÎ KÊMKALORÎ



Bacanên reş:

Bacanên reş pirranî ji avê pêk tên. Di nava 100 gram baca reş de tenê 17 kalorîn hene. Lê belê bacana reş gellekî rûnhez e û rûn dikişîne nava xwe. Ji ber vê çendê divê mirov di dema qelandina bacanên reş de hindik rûn bikarbîne.



Firingî:

Di nava 100 gram bacanên sor de jî tenê 17 kalorîn hene. Taybetiyeke din ya bacanên sor ew e ku ji bo pergala xwîngerîna dil gellekî bikêr e. Sedema wê jî ew e ku di nava bacanê de madeya lycopin ya dijjehrî heye û ev dibe sedem ku laş jî gellek nexweşîyan were parastin. Lycopin herwiha di nava fêkiyên mîna zebeş, gundor û greypfuran de jî heye.



Xas:

Di nava 100 gramên hemû cûreyên xesê de tenê ji 15 heta 20 kalorîn hene. Sedema kêmbûna kalorînê di nava xesê de jî zêdebûna avê ya di nava wê de ye. Xes ne tenê ji bo ziravkirina bejnê baş e, herwiha bandoreke erênî li pergala serifandinê jî dike. Bi vê yekê mîde û rovî baştir dikarin xwarinê biserifînin.



Xiyar:

Taybetiyeke girîng ya xiyaran têhnkujiya wan ya di demsala havînê de ye. Sedî 95ê xiyarê jî avê pêktê. Di nava 100 gramên xiyar de tenê 12 kalorîn hene. Herwiha gellek vîtamîn di nav û di bin qaşûlkên xiyar de veşartî ne. Ji wê yekê, eger xiyar bêhormon hatibin çandin, pêwîst nake ku were qeşartin û tevli qaşûl were xwarin baştir e.

DI SERDEMA DIJITAL DE DEMA

E-WEŞANAN DIYAR DIBE

Ridwan Xelil – ridwanxelil@gmail.com



Rewşa zimanê kurdî li ber çavayê ku di xetereyê mezin de ye. Bi hincetên curbicûr her çiqas li hin zanîngehan beş û li hin dibistanan dersên kurdî hatibin vekirin jî, ji aliyekî din qelskirina van xebatan û astengkirina xebatên ji aliyê kes û saziyên taybet ve tîr kirin jî li ber çava ne.

Ji ber ku gelekên kurdan li tirkî dijîn û herî dawî hewla 15ê tirmehê weke gelek qewimînên din li tirkî qewimî gelek rojname, kovar, televîzyon, sazî, platform, weşanxane û hwd. bi hincetên cûda hatin girtin. Xwedîyên wan û nivîskarên wan bi hincetên cûrbicûr hatin binçavkirin û peşdeçûyîna kurdî di demê kurt de nizanim çend salan paşve çû.

Piştî vê yekê rewşenbîrên kurdan hedî hêdî berê xwe dan ser qada înternetê. Dibe ku sedemê vê jî nivîşa nû ya kurdan bi înternet û komputerê mezinbûnê jî be. Beriya niha çend nûçe hatin weşandin ku di pêşketina kurdî de qonaxên komên xwendinê yên bajarên û blogerên li ser înternetê dest pê kirine. Ev mîzgîniyek pir baş e. Ku kurdên me edî bi mejîyekî kollektîf digihin hev ji aliyekî bi kurdî dixwînin ji aliyekî din ve înternetê bêhtir bikar tînin û bi kêliyan digihîjin her keviyên cîhanê.

Ji aliyekî din ve xebatên ku li ser kaxizê û li çapxaneyan ji xwe re cih nabînin berê xwe dane ser e-weşanê. Her çiqas beriya niha xebatên e-weşanê hebûn jî, îro behtir xebatên e-weşanê li ber çavan e. e-Weşanxaneyên wek Zanîngeh û Nefelê bi dehan pirtûk li ser înternetê bi formata pdfê belavkirine. Piştî e-kovarên wek Zanîngeh(Jimarek, Weşana wê qediya), Zanko(5 jimar, Weşana wê qediya) Kanîzar(16 jimar, Weşana wê dewam dike) Biçûked Kurmanca(2 jimar, Weşana wê dewam dike), PopKurd(7 jimar, weşana wê dewam dike) û kovarên ku nayên bîra min gelek kovar li ser înternetê belav bûn û belav dibin. Niha Mizgînîya çend e-kovarên din ku wê ji ser înternetê bîn belavkirin gihaye guhê min, kovarên zazakî, yên li ser rexneyê û yên çanda populer, yên li ser sînemayê û hwd..



Em vegerin ser dema e-weşanê ya qonaxa dîjîtal, gelo çima e-weşan?

Yek; Kurd bi taybetî li ser xaka Kurdistanê û bi giştî di nav sînorên gelek dewletan de ji Emerîka heta Ewropa ji Ewropa heta Japonyayê belav in. Da ku xebatên tîrî kirin li sînoran neeliqin û di heman demê de li her derê cîhanê belav bibe û kengî Kurdek bixwaze xwe bigihîne van xebatan divê bi sê-çar pişkên kompîtirê karibe xwe bigihîne van e-weşanan.



Do; wek tê zanîn xebatên Kurdî yê çapkirî bi zor û zehmet tîrî belavkirin û gelek caran jî mixabin weşangerên wan xebatan dikevin nav zîr û zîyaneke aborî. Ji ber vê yekê heta niha gelek xebatên Kurdan di nivî de mane an jî ji bo kovaran piştî hejmara yekem ji bo pirtûkan piştî çapa yekem derfet nedîtine ku hejmar an çapa duyem biweşînin.



Sê; Gavên çapkirinê pir in û pir biha ne. Weşanek pêşî tê çapkirin ev malîyeta herî zêdeye, piştê jî çapxanê divê bibin depoyê ev barkirin dîse bihayekî baş digirê, li depoyê ji bo xwîneran tê kargo kirin her kargo bihayê weşanê bi pereyên tirkî 7-8 lîreyan zêde dike. Ji bo ku tiştekî pere jê tê qezençkirin divê para nivîskar an go mafê telîfê hin pere ji bo nivîskar bîr dayîn. Pirtûkên ku zêde mane divê ku bi salan di depoyan de cih bigirin ku daçûya wê ji dahatuya wê zêdetir bibe, dibê ku weşanên ji bo weşanfiroşan hatine şandin neyên firotin û paşve bîr vegerandin, ev jî kargoyek din dixwazê û hwd.



Ji ber van sedeman û hê gelek sedemên ku me nenivîsandine di dewra dawî de kurdan berê xwe dane ser înternetê hin weşan û weşanxane jî bi taybetî tenê ji ser înternetê xebatên xwe dikin.



Her çiqas ji ser înternetê ev xebat karin bên firotin jî, lê ji bo ku "bazara kurdî kesad e" ev xebat bi giştî belaş tên belavkirin. Ev jî xizmeteke mezin e ji bo kurdî, ku hemû kurd bi hişmendiyeke kolektîf jî bo kurdî pêşde herê û belav bibe hem dixebitin hem jî xebatên xwe belaş belavdikin.

Heta nivîsek din bimînin di nav xêr û xweşîyê de.

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

MEJÎ

Kurê Reşîd



MEJÎ JI DU
PIŞKAN PÊK TÊ

nîvê rastê û nîvê çepê

Mejî, mêjî, mejû, mêşik, (bi îngilîzî: cerebrum, telencephalon) beşa herî gir di demaxê mirov de. Navanda çêbûna hizir, hest, bîrhatin, hînbûn, peyvîn, dîtin û kontrola masûlkeyan.

Erk û pêkhatiya mejî

Ji derdor û nav laş de ragihandin û kartêkir ji aliyê demarexaneyên hestê ve tînin şandin bo demax. Piraniya kiloxekelên bi mejî tijî ye. Ango mejî pişka herî gir e demaxê ye. Mejî navenda herî dawî û armanc e ji boy girtin û yekxistina ragihandinan. Mejî bi beşên din e demax ve di nav danûstandinê de ye, çalakiya van beşan ji aliyê mejî ve tînin rêxistin. Li gor kartêkir û ragihandinên ji derdor tînin şandin, mejî ji boy girjbûn an jî xavbûnê ferman dişîne masûlkeyan. Ango, mejî agahiyên ji derdorê hatî saz dike, bi vî awayê bertekên guncav û rêxistî çê dike.

Mejî ji aliyê derve ve werpêçik e. Qurmiçên mejiyê mirov ji yên ajalên din zêdetir e.

Mejî ji du pişkan pêk tê, nîvê rastê û nîvê çepê. Her yekê nîvên mejiyê kontrola nîvêk laş dike, lê ev nîvê laş li aliyê beramberê nîvê mejiyê ye. Wekî mînak heke mirov destê xwe yê çepê dayine ser cemedê, ji cemedê sinyalên sermayê bi navbeynkariya demarên hestê, digihîjin pişka rastê ya mejî. Ango kartikir û ragihandinên ji beşa çepê ya laş, ji aliyê nîvê rastê ya mejî ve tînin hestkirin.

Nîvê çepê mejiyê bi gelemperî bi hunera axivînê, hunera analîtîkê, û matematîkê ve mijûl dibe. Li piraniya mirovan de nîvê çepê mejiyê li ser nîvê rastê serdest e.

Herdu nîvên mejiyê bi navbeynkariya tenê req, bi hev re girêdayî ne.


Tenê req (bi îngilîzî: corpus callosum) ji gurzek tewereyên demarexanayan pêk tê. Tenê req di navbera herdu nîvên mejî de ragihandin saz dike.

Pilên mejiyê


Şeweyê werpêçikî ya tûkila mejî dişibe kendalok û newalokan. Beşên kendalokî wekî jîrî (bi îngilîzî:gyrus) tê navkirin. Pekhatayên nevalokî wekî sulçî tê navkirin. Jîrî ji aliyê sulçî ve ji hev tînin cudakirin. Ango di navbera badokên jîrî de sulçî hene. Sulçî her nîvêk mejiyê dabeşê çar pila dike. Her pilek ji hev cudaye li gor erkê xwe. Navbera pilan de xetek berçav tune ye.

“


*Agahdariyên dîtîni
yên ji çavan tînin li
patikepilê de tê
şîrovekirin.*



Demaxê mirov



Pilên mejiyê mirovan



Pila li aliyê herî pêşî ya li kiloxê wekî pila eniyê (navçavepil) (bi îngilîzî: frontal lobe) tê navkirin. Li paş navçavepilê de pila tasê (dîwarepil) (bi îngilîzî: parietal lobe) cih digire. Li paş dîwarepilê de pila patikê (patikepil) (bi îngilîzî: occipital lobe) heye. Li bin navçavepil û dîwarepil de pila cênikê (cênikepil) (bi îngilîzî: temporal lobe) cih digire.

Navçavepil bi karên wek kontrola masûlkeyan, peyvîn, plan çêkirin, biryar dayîn û kesayetî re tekîldare. Pîvazokên bêhngirtinê di navçavepilê de cih digirin, li vir bêhna hawirdorê tê şîrovekirin.

Herwisa navçavepil beşa tûkila livînê jî lixwe digire. Ev beş ji bo plansazkirin û bicihanîna livînê girîng e. Ango beşa tûkila livînê (bi îngilîzî: motor cortex) cihê kontrolkirina masûlkeyên laş e.

Dîwarepil bi gelemperî karê bîr û hestê re tekîldare. Wekî mînak gava mirov destê datîne ser tiştekî, nîrxandina şêwe û pêkhatina tiştan di pila tasê de tê hest kirin. Cênikepil bi bîhistina deng û bêhngirtina tiştan re tekîldare. Herwisa ji serpêhatiyên me yên borî de çêbûna bîr(hiş) jî li vir rû dide.

Agahdariyên dîtînê yên ji çavan tînin li patikepilê de tê şîrovekirin. Herwisa, bîrhatinên derbarê dîtina tiştan de li patikepilê de tê embarkirin.

Tûkila Mejî

Her nîvek mejiyê ji aliyê derve madeyê gewir lixwe digire. Ev beşa gewir wekî tûkil tê navkirin. Teweriyên demarexaneyên tûkila mejî ne maylînê ne. Li tûkila mejî de 100 bîlyonê (mîlyar) zêdetir laşê demarexaneyan heye. %80yê mejiyê mirov ji tûkila mejî (bi îngilîzî: cerebral cortex) pêk tê. Tûkila mejiyê mirov gellek werpêçik (lozdar) e. Werpêçikî angî qurmiçînê rê dide mejî ko bi rûyek fireh, li cihek teng de cih bibe.

Erkê tûkila mejî

Sê karên sereke têkiliye bi tûkila mejî:

1-Erkên bingeînên çalakiya hîşî yên wekî, bîr, raman, fêrbûn, biryar dayîn, hesta berpirsariyê

2-Hestkirin. Ango girtin û şîrovekirina hesten wekî mînak hêstkirina êşê, germahiya hawirdore, tahmkirina xurekan, bêhngirtina kulîlkan.

3-Kontrola çalakiyên masûlkeyên peykerê.

Beşên tûkila mejî


Li gor pêkanîna erkê xwe, tûkila mejî dabeşî sê beşan dibe;

1.Beşên livînê (bi îngilîzî: motor areas); li beşa pişt(para) ya navçavepilê de cih digire. Kontrola girjbûn û xavbûna masûlkeyên peyker dike.

2.Beşên hestê (sêhkirin)(bi îngilîzî: sensory areas); Beşa hestelaşê li aliyê pêşî yê dîwarepilê de cih digire. Bi navbeynkariya hestewergiran, ji endamên hestê yên wekî çav, guh, pest, ziman û difin agahî digire û şîrove dike.

3.Beşên pêwendîkirinê(bi îngilîzî: association areas); Her çar pilên mejî beşa pêwendîkirinê lixwe digin. Beşên pêwendîkirinê navend e ji boy karê entelektuelî, bîr û ziman (peyvîn). Herwisa şîrovekirina agahdariyên hestê li vir rû dide.

Navikên bingeîn,ji boy girjkirin an jî xavkirina masûlkeyên guncav, fermanên livînê, tekûzkarî dike.



KURDÎ	ÎNGÎLÎZÎ	TIRKÎ
cênikepil	temporal lobe	şakak lobu
demarexane	nerve cell / neuron	sinir hücresi
demax	brain	beyin
dirkepetik	spinal cord	omurilik
diwarepil	parietal lobe	pariyetal lob
girjbûn û xavbûn	contraction and relaxation	kasılma ve gevşeme
kilox	skull	kafatası
kiloxekelên	cranial cavity	kafatası boşluğu
koendama demarê	nervous system	sinir sistemi
madeyê gewir	gray matter	boz madde
madeyê spî	white matter	ak madde
mejî	cerebrum	uç beyin
mejîk / mejîkok	cerebellum	beyincik
navçavepil	frontal lobe	ön lob
nîvê çepê mejiyê	left cerebral hemisphere	sol yarım küre
nîvê rastê mejiyê	right cerebral hemisphere	sağ yarım küre
patikepil	occipital lobe	artkafa lobu
pilên mejiyê	brain lobe	beyin lobu
pivazoka bêhngirtinê	olfactory bulb	koku soğancığı
tekûzkarî	integration	birleştirme
tenê req	corpus callosum	nasırlı cisim
tûkila livînê	motor cortex	motor korteks
tûkila mejiyê	cerebral cortex	beyin kabuğu
werpêçik / lozdar	folded	kıvrımlı

Madeyê spî

Nîvên mejiyê ji aliyê hundirê ve madeyê spî lixwe digirin. Madeyê spî ji tewerêyên bi maylînî pêk tê. Tewerêyên bi maylînî di navbera beşên demaxê de girêdan ava dike. Tewerêyên madeyê spî bi şeweyê gûrzek li ba hev dirêj dibin.


Erkê madeyê spî

- Demarexaneyên heman nîvê mejiyê bi hev re girê dide.
- Nîvê rastê bi nîvê çepê mejî ve girê dide.
- Mejiyê bi beşên din ên demax û dirkepetikê ve girê dide.

Navikên bingehîn

Di nav madeyê spî yê nîvên mejî de li hin cihan madeyê gewir heye. Van pêkhateyên gewir wekî navikên bingehîn(bi îngilîzî: basal nuclei) tên navkirin. Navikên bingehîn, Ji boy girjirin an jî xavkirina masûlkeyên guncav, fermanên livînê , tekûzkarî dike. Bi tekûzkariye rêxistina livîna masûlkeyan tê piştraskirin. Heke hin ji demarexaneyên navikên bingehîn têk bişke, bimire, li mirov de nexweşiya parkinson peyda dibe.

ÇEND PIRTÛK





Çend Derûnnasên Herî Navdar

METÎN ESER

Psîkolojî (giyannasî-derûnnasî), zanîna li ser tevger, rûdan û çalakiyên derûnî yên mirov e ku jê re "jiyana hundirîn" jî tê gotin. Peyva psîkolojî ji du peyvên Yewnanî (Grekî) pêk tê, peyva psyche ku tê wateya "giyan", û logos ku tê wateya "serûderî-serwextî". Em bi gotineke din wiha jî dikarin bibêjin "serwextiya giyanê."

Helbet di vê qonaxê de mirovên ku bi kar û xebatên xwe dengvedane û bi gavên mezin pêşketinên girîng bidest xistine, hene. Em ê bi kurtenivîsan danasîna çend giyannasên navdar bikin ku pîvana rêzkirinê ya kesên di vê lîsteyê de ji bandora xebatên wan pêk tê.





ABRAHAM MASLOW

Abraham Harold Maslow roja 1ê nîsanê (ne henek e ha!) ya sala 1908an de Xwedê daye û di 62 saliya xwe de roja 8ê tebaxê ya sala 1970an çûye ber rehma Xwedê. Dibe ku bala we kişandibe tevahiya giyannasên heya a niha rêzkerî 80 salî û ji 80 salî mezintir bûn lê Maslow ne ji wan e. Abraham Maslow Amerîkayî bû ku dê û bavê Cihû û Rûsyayî bûne, li hember fikar û dîtinên Watson û Skinnerî yên derbarê tevgerîtiyê serî hildaye. Di salên xortaniya xwe de weke Watson û Skinner piştgiriya bizava tevgerîtiyê kiriye lê di salên 60î de ji vê bizavê veqetiye û berê xwe daye giyannasiya mirovhez (humanîst). Em Pramîda Maslow ku li ser pêdiviyên mirovî hatiye çêkirin, deyndarê wî ne û li gorî wî divê pêdiviyên mirovî bi awayeke rêzkerî û yek bi yek bên çareser kirin. Bêyî çareser kirina pêdiviyên piçûk çareser kirina pêdiviyên mezin ne pêkan bû.

Maslow li ser psîkolojiya zanistê jî pirr gotar nivîsandîye ku heya wê gavê zanist di qalibê psîkolojiyê de bi tenê li ser "mirovên ji rêzê" mijûl bûbû lê Maslow di wê bîr û baweriyê de bû ku zanyar jî "mirov" bûn û berê xwe dide zanyaran. Ji bo zanyaran lîsteya xwe paqijkirinê çêdike û xalên vê lîsteyê di pirtûka wî bi navê Psîkolojiya Zanistê ya di sala 1974an de derçûye de jî tê dîtin.

CARL JUNG

Carl Gustav Jung roja 26ê tîrmehê ya sala 1875an li Swîsreyê Xwedê daye û di 85 saliya xwe de roja 6ê pûşperê ya sala 1961an de çûye ber rehma Xwedê. Ji ber xebateke xwe di sala 1932an de xelata Zûrîxê ya beşa edebiyatê wêrdigre û di sala 1938an de jî bi endametiya Royal Society of Medicine ku pirr biprestîj e, tê rûmet kirin. Carl Jung ji ber xebateke xwe û berdewam kirina xebatên Freudî dengvedaye.

Carl Jung dema zarotiya xwe de bi êrîşeke hevalê xwe yê dibistanê re rû bi rû dimîne û ji ber vê êrîşê jibîrve dihere. Piştî vê bûyerê her ku Carl Jung dixwest karê xwe ye xwendinê bike yan jî dema diçû dibistanê, jibîrve dihere, dê û bavê wî di wê bîr û baweriyê de bûn ku Carl Jung bi nexweşîya fê-bêhişî/epîlepsiye nexweş ketibûye. Bavê Carl Jung rojekî di civînekê de qala rewşa kurê xwe dike, derbirîna fikar û xemxwariya ya li ser kurê xwe dide der. Carl Jungê 12 salî ji vê derbirîna bavê xwe agahdar dibe û destpê xebatên xwe dike, ji piştî çend carên jibîrve çûyîna Carl Jungî biser dikeve ku bi vê helwesta xwe destpê rêwitiya ber bi giyannasekî binavûdeng dike û heya dawiya emrê xwe ji vê tengaviya jibîrve çûyîna xwe xelas dike.

Di sala 1903an de bi Emma Rauschenbach re dizewice, her çiqas heya dawiya emrê xwe bi wê re zewicî bimîne jî hin agahiyên ku têkiliya wî ya bi jinên din re jî, hene.




ANNA FREUD

Em ji bo kurtedemekê vegerîna li malbata Freudî dikin û bîr û bala xwe didin keça Sigmund Freud ya bi navê Anna Freud, li Awistiryayê roja 3ê kanûna pêşin ya sala 1895an de Xwedê daye. Di 86 saliya xwe de roja 9ê çiriya pêşin ya sala 1982an de çûye ber rehma Xwedê.

Anna Freud di warê giyannasiya-zarokan de pêşengîti kiriye, ji xebata bavê xwe ya bi navê psîkoanalîzê sîd wergirtiye û pratîze kirina wê xebatê li ser koma zarokan pêk aniye. Bi vê xebata xwe re cudahiyên mezin yên di navbera mirovên kemal û zarokan de tespît kiriye.

Gotineke wê ya li ser çavbirçîti û tetmîn nebûna mirovan ku pirr balkêş e, gellekî manîdar e; "eger tetmîn kirina hinek hewes-daxwaziyên me ne pêkan be, ecêbmayî nemînin lewre ji vê rewşê re jiyan tê gotin" û dû re Maslow jî balê dikişîne li ser vê rewşa mirovahiyê.



ERİK ERİKSON

Erik Homburger Erikson roja 15ê pûşperê ya sala 1902an de Xwedê daye, di 85 saliya xwe de roja 12ê gulanê ya sala 1988an de çûye ber rehma Xwedê. Giyannasekî Danîmarkayî ye û weke Anna Freud li ser giyannasiya zarokan baldar bûye.

Erikson ji malbateke Danîmarkayî bû lê li Almanyayê Xwedê daye û ji ber rûdana şerrê cîhanê bêgav dimîne û berê xwe dide Amerîkayê ku li wir dihere ber rehma Xwedê. Erikson weke yek ji giyannasên post-freudî tê qebûlkirin ku ji vê bizavê re "giyannasên-egoyê" jî tê gotin.

Ji navê vê bizavê diyar e ku giyannas li ser xweperestî(ego) û hesîna nasnameyê ya mirovî disekinin û xebatên xwe pêk tînin.



JEAN PIAGET

Jean William Fritz Piaget roja 9ê tebaxê ya sala 1896an Xwedê daye, di 84 saliya xwe de roja 16ê çiriya pêşin ya sala 1980an de çûye ber rehma Xwedê.

Jean Piagetê Swîsreyî jî weke Anna Freud û Erik Erikson li ser giyannasiya zarokan baldar bûye. Bi taybetî li ser tevgerên kapasîteyên pevnasîne xebatên xwe pêk aniye.

Giyannasê pêşin e ku cudahiya fikirîne ya di navbera zarok û mirovên kemal îspat kiriye. Xebatên wî hê jî bo giyannasên peresîne warê sûd wergirtîne ne.



SÎGMUND FREUD

Sigismund Schlomo Freud roja 6ê gulanê ya sala 1856an li Awistiryayê Xwedê daye û di 83 saliya xwe de roja 23ê çiriya pêşin ya sala 1939an de li Brîtanyaya Mezin çûye ber rehma Xwedê.

Ji ber ku Awistirya ji aliyê dewleta Almanan ve hatibû dagir kirin û Freud jî bi eslê xwe ve Cihû bû, neçar û bêgav dimîne û berê xwe dide Brîtanyaya Mezin ku li wir ji ber nexweşiya kula heftpençeyê, dibe ku ji ber serhişkiya cixare kişandinê, dihere ber rehma Xwedê.

Ev giş li vî alî, li aliyê din Freud bi xebatên xwe yên nirxdar û bînirx xizmeta beşa giyannasiyê kiriye. Xebat û teoriyên wî yên derbarê psîkoanalîzê weke xebatên wî yên pirr nirxdar tîr qebûl kirin.

Freud jî weke Pavlov ne giyannasekî fermî lêbelê tûrenasek (norologek) bûye.

YAN ZIMAN YAN GORISTAN

Çi civateke li jiyane ku ne xwediyê ziman, çand, tore, dirok û warekî be, ew civat goristaneke bê kêlik e. Lê belê eger ew civat xwediyê ziman, çand, tore û dirokekê be, lê wan bi kar nayne û warê xwe jî naporêze, ew civat goristaneke bi kêlik e.

Lê eger ew civat çanda xwe binase, li gor toreya bav û kalên xwe bilipike, diroka xwe bizanibe, bi zimanê xwe bipeyive û xwedîtî jî li warê xwe bike, hingê ew civat gulistaneke şên e.

Îcar eger di nava wê gulistana şên de ziman, çand û toreyan cuda jî hebin, hingê ew gulistan dibe gulistaneke pirdeng û pirreng. Ha ew jiyane, xweşiya ku ji xwedanê suruştê wek diyarî bexşendeyê mirovan bûye, bi xwe ye.

www.arsivakurdi.org



TÊKILÎ JI RÊZIKAN GIRÎNGTIR IN

WERGÊR: AHMED SUBAŞI

SERERASTKIRIN: HARUN DELÎKAYA

Hînbûn bêyî têkiliyan pêk nayê. Di polê de rêzik girîng in, lê piştî çend salên mamostetiyê gellek ji me hîn dibin ku têkilî girîngtir in. Yek ji rêyên berfirehkirina têkiliyên me yên bi xwendekaran re jî, kêm be jî bi wan re parvekirina tiştêkî derbarê xwe de û derfetdayîna parvekirina wan ya bi me re û ya di navbera xwe de ye.

Helbet girîng e ji roja yekem ve diyarkirina rêzikan, rûtînan û rêgezan bi hêmanên bingeîn, da ku xwendekarên we bizanibin bê ka çi li hêviya wan e. Em wek mamosteyan di heyamên ewil yên karên xwe de vêya hîn dibin: Di mijara bendewariyên polê de ji serî ve eşkere û hişkbûn, di mijara derbaskirina saleke çawa de cudahiya herî mezin pêk tîne.

Lêbelê piştî parvekirina rêzik û bendewariyan, hûn bo xwendekaran çawa li derbasbûna tiştên taybet û parvekirina çend agahiyan yên di derbarê xwe de dinêrin?

Hûn dikarin agahiyan gelemperî jî parve bikin (wek kitekitên di derbarê malbata de, dibistanên ku hûn çûnê, karên ku berî mamostetiyê we dikir), lê di heman demê de hûn dikarin qala çend mijarên hestiyar di derbarê jiyana xwe de jî bikin.

Di pêvajoya mezinbûnê de di kîjan mijara de we dijwarî kişandin? Nemaze di xwendekariyê de



-Hûn qedir didin çi?

-Hûn ji çêkirina çi hez dikin?

-Ger ku we bikaribûna, di derbarê dinyayê de we yê bixwestana çi biguherînin?

-We bizanibûna ku dê bi kêr were we yê di jiyane de çi rîsk bistendana?

Hûn bo parvekirina tiştên taybet çi dibêjin? Bo nimûne hin pirtûkên ku hûn di jiyane de zêdetir ji wan hez dikin. Di 12 saliya xwe de pirtûka ku we zêdetirîn jê hez dikir kîjan bû? 16 an jî di temenê 20an de? Ji bo ku hûn nîşanê xwendekarên xwe bidin ji van pirtûkan bînin dibistanê. Anîna wêneyên ji jiyana xwe her tim eleqeyeke mezin dibîne.

Lêbelê ez ji bo çi parvekirineke bi vî awayî pêşniyaz dikim? Nîşandayina aliyê me yî mirovî bo xwendekaran, ne tenê "mamostebûn" mirovbûna me jî nîşan dide.

Li gor çavdêrî û serpêhatiyên min, ji bo ku hûn ji aliyê xwendekarên ku xwe ve bînin hez kirin aliyên xwe yê takekesî (herwiha xeydokî) nîşan bidin, car caran divê kîbûna xwe, hestên xwe, diwariyên ku hûn dikişînin, hêviyên xwe, tiştên ku hûn qedir didin wan û xeyalên xwe derxin holê. Em ji xwendekarên xwe dixwazin ku nivîs, helbest an jî axaftinên di derbarê takekesiya xwe (herwiha xeydoktî) de binivîsin. Em mamoste, wek endamekî civaka polê divê em jî heman tiştî nekin?

Xwendekarên ku Hev Baş Nas Dikin

Piştî ku we di derbarê xwe de hin agahî parvekirin ji bo kirina heman tiştî xwendekaran jî vexwînin. Gava ku we hin agahiyên takekesiya xwe da û bi eşkereyî tevgeriyên hînga hûn ê vê bingehe amade bikin,



ku ev ji bo we girîng e û dê bibînin ku hûn komeke ku tenê ji mamoste û xwendekaran pêk tê nînin, di heman demê de dê bibînin ku hûn civakeke mirovî ne.

Vaye ji bo xwendekar hev nas bikin û dest bi danîna têkiliyan bikin çend çalakiyên bikêrhatî:

Tiştên Baş: Ji xwendekaran bixwazin ku komên du kesî ava bikin ku ev kom di navbera xwe de bibin cot û bixwazin tiştên baş ên ku hatine serê wan an jî tiştê baş ku bi çar çavan li bendê ne bi hev re parve bikin. Ne hewceye tiştê mezin be. Dibe bi qasî "me îro di malê de şeva pîzzayê çêkir," jî hêsan be. Belkî xwişka xwendekarekî nû zewicî be yan jî hefta bê rojbûna yekê be. Her roj an jî her destpêka saeta dersê bi çalakiya "Tiştên Baş" dest pê bikin.

Piştî ku xwendekaran bi rihetî dest bi parvekirinê kirin ji bo ku hûn pêwendiyên wan yên civakî bi hêztir bikin çalakiya xwe bi komên ku ji çar an jî pênc xwendekaran pêk tê, pêk bînin. Hûn jî parve bikin.

Tûrikê "Di Derbarê Min de Her Tişt"

Biafirînin: Tûrikekî wek tûrikê xwarinê bidine her zarokî. Ji wan bixwazin ku derveyê tûrikê xwe, bi peyvên ku jê hez dikin an jî yên ku kesên dîtir di derbarê wan de bi hêsanî dibînin an jî bi wêneyan rû bikin.

Ji wan bixwazin ku hindirê tûrik jî, bi tiştên ku di derbarê wan de bi hêsanî nayên dîtin an jî temsîlkirina tiştê nenasbar an jî hin cûre objeyên ku tên sembolîzekirin bi cîh bikin (wek, pêlîstokeke xwe yan wêneyekî ku di dema lîstina futbol de hatiye girtin).



Ku hûn ji xwe re jî yekê çêbikin, hûn di dema xwedanasîna xwe de dikarin parve bikin. Ev, dê ji wan re bibe modelek. Demê bidin wan ku bi hevalekî/ê re yan jî di hindirê komên piçûk de parve bikin.

Eynî Wek Min: Ev metoda afirandina koman ku çalakiyeke kevn lê bi bandor e, xwendekrên ku bi wan re xalên hevpar hene an jî xwendekarên dîtir yên ku taybetiyên wek hev parve dikin, peyda dike. Mamoste daxuyaniyekê dike û xwendekarên pêwendîdar radibin ser nîga. Bo nimûne wek, "Xwarina ku ez pir jê hez dikim meqerna ye", "Ji bo ku dibistan dest pê kiriye ez dilşad im" an jî "Piçûkê malbatê ez im". Xwendekarên ku piştî daxuyaniyê radibin ser xwe berî ku rûnên ji wan bixwazin ku bi xwendekarên dîtir, yên ku bi wan re xalên hevpar hene qeyd bikin.

(Vê çalakiyê, bi daxuyaniyên ku bêtir bi kûr ve diçin, di navbera çend rojan de an jî di rojên çawalêhato de bikin.)

Parvekirina Tiştên Taybet: Wek pirtûkên ku we di zaroktiya xwe de ji wan hez dikir hûn bînin polê, hûn dikarin ji xwendekaran jî bixwazin ku wêneyan, pirtûkan an jî wek xelatan û hin tiştên taybet bînin û wan yek bi yek, bi awayê komên piçûk an jî bi hemû polê re parve bikin.

Rapirsiya Agahiyê yê Xwendekar: Hûn dikarin li gor temenê xwendekaran û li gor mijarê hin cûre rapirsiyan bikin. Ji bilî (wek, xwarin, stran, û beşeke sporê) pirsra tiştên ku xwendekar jê hez dikin,



hûn dikarin wek pirsên bi vî awayî gellek pirsan biafirînin "Tu dikarî dibistanê bi çend peyvan pênase bikî?", "Tu dikarî xwe bi çend peyvan pênase bikî?", "Heya niha mamosteyê te yê/a herî baş kîjan bû û taybetiyên wî/ê yên herî girîng kîjan bûn?" "Bi mirovekî/e navdar re şansê te yî xwarinê hebûna te yê kî/ê hîlbijarta?", "Bo ku ez di polê de serkeftina te bi dest bixim wek mamosteyekî, tiştê girîngtir ku te yê ji min bixwesta çi bû?".

Ji xwendekaran bixwazin ku rapirsîyê biqedînin û ji bo ku hûn wan baş nas bikin wek mamosteyê wan daxuyaniyê bidin ku we ev rapirsî xwestiye.

Berî ku hûn rapirsîya bidin hev ji xwendekaran bixwazin ku bersivê an du bersivên ku bixwazin bi kesên din re parve bikin hîlbijêrin.

Bo parvekirinê hêviya wan bisekinin da ku wek komên piçûk ji hev veqetin.

Têkiliyên samîmî ji bo hînbûnê girîng in. Ji bo parastina poleke ku baş bi rêve tê birin divê rêzik û rêgez bêne bi kar anîn. Lê ji bilî balkişandina kontrola we ya bênavber ya li ser xwendekaran, danîna têkiliyan û afirandina civatekê dê bike ku sala dibistanê ji bo her kesî baş derbas bibe ku ev, ji hêmanên herî hêja û misoger e.

Jêgirtin: perwerdia.wordpress.com

Çavkanî: <http://www.egitimpedia.com/i>
[liskiler-kurallardan-daha-onemlidir/](#)



Faydeyên Komên Xwendinê Çi ne?

[3 Pirs -3 Bersiv]

Endamên komê bi awayekî bernamêyî û bi disîplîn xwendinan dikin

1. Çandname: Hûn demeke dirêj e ku ser koma xwendinê dixebitin. Gelo faydeya komên xwendinê çi ne?

Ayetullah Badikî: Feydeya komên xwendinê ew e ku endamên komê bi awayekî bernamêyî û bi disîplîn xwendinan dikin. Dema pirtûkên li ber destan xilas dibin, bo şêwra pirtûkê, endam li cihek kom dibin û bi hev ra şêwra xwe dikin. Her yek ji alîyek da pirtûkê dinirxîne û di dawîyê da encameke zor baş derdikeve holê.

Car heye dema mirov pirtûkek dixwîne hinek taybetîyên pirtûka bala mirov nakişîne. Lê dema hevalên pirtûk xwendine diaxivin mirov dibêje, ez qet wusa nefikirîbûm. Û di xwendineke din da êdî çarçoveyeke firehtir li pêş mirov e. Wuha wuha di her xwendinek da mirov tiştek li ser rêbaza xwendina xwe zêde dike.



2. Çandname: Dema mirov kitabên Kurdî dixwîne jê çi sûd digre?

Ayetullah Badikî: Jixwe mebesteka me jî ew bû ku em balê bikişînin ser pirtûkên Kurdî. Em dibînin ku her sal her sal pirtûkên nû li ser selika edebîyata me zêde dibin. Lê gelo ev pirtûk tên xwendin an nayên xwendin, li pêşber nivîskar û helbestvanên me bazareke bi çi hawê heye, ev berhem ji xwe ra muxatab dibînin an nabînin. Piranîya bersivên van pirsan me dît bersivên neyînî ne. Vêca me got qet nebê, bo bûyîna mînakeke baş, bo balê kişandina ser van pirtûkên Kurdî me dest bi xebateke wuha kir. Xwendin jixwe karek pîroz bûye, di hemûyê dem û dewranan da. Vêca xwendina li ser zimanê me helbet pîroztir û hêjatir e. Ev ji bo hemûyê gelan welê ye.

Heke ez bi qasî xwendin û fêmkirina pirtûkên bi zimanê xwe hakimê zimanê xwe nebim ez dê xwe çawakî wek endamê vî gelê bibînim, ez dê çawakî vî zimanê wek zimanê xwe binasim. Xwendin xweş e, ya bi zimanê mirov xweştir e, em dibêjin.

3. Çandname: Ji bo xebatên komên xwendinê zêde bibin divê çi were kirin?

Ayetullah Badikî: Bo ku ev karekî xwebexş e û bo ku endamên van koman ji kesên xwebexş tene bijartin, avakirin û birêvebirina van koman karekî piçek dijwar e. Gelek gelek pîrsgirêk û asteng hene di pêş van koman da. Lê ji bo hejmara van koman zêde bibin mirov dikare van koman teşwîq bike. Çawa?





Niha derdora deh heban da weşanxaneyên me yê aktîf hene. Ev weşanxane dikarin bo van koman buhayê pirtûkên xwe piçek daxînin. Qet nebe dikarin bi buhayê ku ji pirtûkfiroşan ra dişînin dikarin ji van koman ra pirtûkan bişînin. Weke din kesên ku bi zimanê xwe nexwendine lê dixwazin ji kesên xwenda ra bibine alîkar dikarin ji layê aborî da piçek alîkarîya van koman bikin, wek sponsorek li pişt wan bisekinin.

Piştgirîyên bi vî awayî xebatên komî domdartir dikin. Di dawîyê da jî bi zêdebûna van koman ew dê bazara pirtûkên Kurdî geş bibe û namzedên nivîskarîyê jî dê ji vê bazara geş hêzê bistînin û xwe dirêjî pênûsên xwe bikin û binivîsînin.

Hevpeyvîn:

Çandname û Ayetullah Badikî





ÇEND PÊKENOK

Zinarê Xemo

1

Girîyê ji bo ker

Gundî bala xwe didinê melê gund li ber termê kerê xwe yê mirî rûniştîye û kûre kûra wî ye digrî. Jê ra gotin:

-Mele, malneket, jina te mir hêsir bi çavên te neket, lê ji bo mirina kerekî pişturmî tu rûniştîyî û wek zarokan hêsiyan dibarînî.

Ma ev bi te dikeve?

Mele got:

-Dema jina min mir, we hemûyan ji min ra got, "xwe zêde li ber nexe, emê yeka çêtir ji te ra bînin." Ê de ka ji min ra bibêjin, heta nuha we kê ji min ra gotiye "megrî", emê kerekî baştir ji te ra bikin?

2

Me ji sifirê dest pê kir

Rojekê xortek apê Mûsa Anterê rahmetî rexne dike, jê ra dibêje:

-Halê îro em tê da ji ber kêmîxîretiya pêşiyên me ye. Heger hûn jî di wexta xwe da wek me xebitîbûna, me yê nuha ji sifirê dest pê nekira.

Apê Mûsa mizicîye, ji xort ra gotiye:

-Bavê apê xwe, çaxa me dest pê kir rewş 20 derece di binê sifirê da bû. Îcar heta me ji we ra gîhand sifirê, çermê eniya me qetiya, diya me hat gadan...

3

Carê yekî alman bi nêta tirkekî li yekî kurd xistiye, yê kurd gotiye law ez ne tirk im, ez kur dim, li min nexe.

Yê alman gotiye:

-Wê demê te bêtir lêxistin heq kiriye, heger hûn ji tirkan ne pîstir bûna hûn nediketî bin destê wan.



Hemoyê Ker

Li gundekî yek hebû, navê wî Hemo bû. Lê mîlet jê ra digot Kero û Hemoyê ker. Hemo xwe ji vê leqeba xwe qet aciz nedikir, lê xanima wî pir li ber xwe diket. Jinikê rojekê ji Hemo ra got:

-Hemo, ji ber vî navê te ez dikevim binê erdê, rabe berxekî xwe şerjê bike, muxtar û rîsîpiyên gund biezimîne û vî navê pîs ji ser xwe rake. Ya na bi Xwedê ez û tu rojekê li ba hev nemînin. Hemoyê reben ji mecbûrî bi ya jinikê kir, çû berxekî xwe avêt erdê, şerjê kir. Û dûra jî muxtar û rîsîpiyên gund ezimandin, ji bo ku navê wî biguherînin.

Mîvanan piştî xwarin û vexwarinê ji Hemo ra gotin:

-Heyran me daxwaza te qebûl kir û me navê te guherand, me navê te kir dahşîk. Ji îro û pê va emê ji te ra bibêjin Hemodahşîk.

Hemo bi dîlşadiyeke mezin baz da aliyê malê û ji xanima xwe ra got:

-Hurme mizgîniya min li te, navê min guhertin.


Jinikê got:

-Kirin çi?

-Kirin dahşîk, ji îro û pê va navê min êdî Hemodahşîk e.

Jinikê got:

-Wey li min porkurê! Lawo bi rastî jî tu ker î. Law ma tu nizanî dahşîk mezin dibe, dibe ker.



Kurê heywanekî

Di îşkencexana zindana Diyarbekrê da zabitekî tirk li hefsiyekî kurd dixe, di ber ra jî tim zirtan dide xwe û dibêje:

-Navê min şêr lawê şêra ye, zû bipeyive, ya na ezê te perçe-perçeyî bikim!

Lê girtiyê kurd napeyive. Bîstek derbas dibe, zabît dîsa bi hêrs dipirse:

-Zû bibêje navê min çiye?

-Weleh tu heywan kurê heywanekî bû, lê nuha navê wî heywanî nayê bîra min.

Tu hevalê kê yî?

Çend nêçîrvan rûniştibûn û ji hev ra qala bîranînên xwe yên nêçîrvaniyê dikirin. Yekî ji hevalekî xwe pirsî:

-Em bibêjin li daristanekê tu bi tenê yî û ji nişka ve hirçekê êrîş anî ser te. Tu yê çer bikî?

-Ezê tivinga xwe ji milê xwe deynim û têkim eniya wê.


-Em ferz bikin ku tivinga te tune ye.

-Wê demê ezê kêra xwe bikşînim û pê xwe biparêzim.

-Em ferz bikin ku kêra te jî tune ye.

Li ser vê, nêçîrvan bi hêrs got:

-Lawo nuha tu hevalê min î yan tu hevalê hirçê yî?



EZ DIXWAZIM BI VÊ NAMEYÊ HEMÛ HEST Û BÊRIKIRINÊN XWE BI TE RE PARVEBIKIM

Abdurrahman Aydoğdu

Bizani be ti dem û wextê de
Tu qet ji bîra min naçî.
Nizanim êdî bû çend roj in
Min tu nedîtî û dengê te nebihîstî.
Lê her tim û her dem
Tu di bîra min de yî!
Ez her tim te difikirim!
Û
Te tînim bîra xwe...

Di xeyalên xwe de bi te re me...
Tu carî ji te dûr neketime
Tenê ev bedena min
Li gor rojên salnameyê
Neh meh in di girtîgehê de ye!..
Ev bedena min neh meh in girtî ye...
Ango ev beden neh meh in ji te dûr e!..

Lê ez nizanim ev bû çend roj in
Ez ji te dûr im!
Ev beden ji te dûr e!
Bi rojên salnameye bawer nakim...
Divê ne neh mehbîn!
Lewre bi bedeneke ji te dûr
Her rojên min wek salan derbas dibin.
Ji ber vê jî min êdî hejmara rojan ji bîr kirî

Tu dizanî ev ji bo min
Ne tiştêkî hêsan e, ku ez ji te dûrbim,
Bêhnê bistînim û bijîm!..

Min dijiwariya van çar dîwaran
Min dijiwariya vê girtîgehê
Û
Bedena girtî ji bîr kirî...
Ji ber ku tu tişt ji bo min
Ji te dûrbûnê ne dijiwartir e!



Tu dîzanî di bin van şert û mercan de
Di nav vê diywariyê de
Tu tişt ne xema min e
Ez ber tu tiştî nakevim...
Ji xênçî te...
Erê ji xênçî tel

Tenê ber te dikevim
Û
Bêriya te dikim.
Dixwazim te bibinim
Û
Dengê te bibihîzim...
Lê nabe
Ji ber ku ez girtî me
Û
Di girtîgehê de tu tişt bi dilê mirovan
nabel..

Tu dîzanî rewş ev e
Lê ez bawer im
Û
Bi hêvî me
Dê rojên azad jî bîn...
Ez û tu em ê bi hev re
Jiyanek azad parvebikin...

Baş bizanibe;
Ev çar dîwar ne sînore
Ev girtîgeh ne asteng e
Û
Baş bizanibe;
Min ji te pir hez kir
Ez ji te hez dikim
Û
Ez ê her tim ji te hez bikim...

Û
Ez jî baş dizanim
Ji bo min;
Tiştê herî girîng û taybet
Ji te hezkirin e...
Ev jî ji bo min bes e...

23.08.2017

Girtîgeha Rihayê

DI 'ADAT Û RUSÛMATNAMEÊ TEWAYIFÊ EKRADIYE DE JINA KURD


Medeni ÖGÜT



Kurte:

Emê di vê xebata xwe de bi kurtasî li ser jiyana Mela Mehmûdê Bazidî û di berhema wî ya hêja a bi navê " Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye" de mijara jina Kurd rawestin. Xebata me wê bi piranî li ser mijara jina Kurd be. Armanca vê xebatê ev e: Em dixwazin bê zanîn ku Mela Mehmûd çi qas girîngî daye mijara jinê û bi hûrgilî ciyê jina kurd di civaka Kurd de hilgirtiye dest. Mela Mehmûd di wêjaya kurdî ya pexşanî de ciyekî girîng digire. Xebatên Mela û A. Jaba ji bo naskirina civaka Kurd peywira neynikekê dibînin. Nexasim di civaka Kurd de ciyê jina Kurd ku mijara me ye, bi saya xebat û keda wan wê bi zelalî were famkirin.

Peyvên Sereke: Mela Mehmûd, A. Jaba, Jin, Jina kurd



Destpêk

1. Bi Kurtasî Jiyana Mela Mehmûd û Xebatên Wî

Mixabin di dest de agahiyên berfireh û pêbawer ên di derbarê jiyana Mela Mehmûd de gelek kêmtir in. Li gor agahiyên berdest —ew jî nameya A. Jaba ye ku di 10/22 Îlona 1857an[1] de ji P. Lerch re şandiye û tê de dibêje Mela Mehmûd Kurd e, şêst salî ye, lê hê li ser xwe ye. Vêca dema ku ev name di sala 1857an de hatiye nivîsîn, ew jî nîşan dide ku Mela Mehmûd di sala 1797[2] de li Bazidê — Bazid wê demê di pergala rêveberiya Osmanî de navenda sancaxê bû— ji dayik bûye. Lê ligel hin lêkolîn û belgeyên din, di derbarê jidayikbûna Mela Mehmûd de dîtî û ramanên cuda hene. Ev jî nîşan dide ku agahiyên vebir tune.

Mela Mehmûd li navenda Bazidê mezin bûye, bajarî ye û ne koçer e, dema berefehmî dibe dest bi perwerdeya xwe dike. Li gor edetên dema xwe li

medreseyên Kurdistanê bi Qur'anê dest bi xwendina xwe dike peyre diçe Tebrîzê, di nav gencîneya edebiyata serdest ya Farisî û Erebî de xwendina xwe diqedîne. Ligel vê fêrî Tirkî jî dibe, lewra zimanê dewleta Osmanî Tirkî bû. Ango Mela Mehmûd ji bilî zimanê xwe Kurdiya Kurmancî; Erebî, Farisî û Tirkî dizanibû.[3]

Mela Mehmûd di sala 1854an de tê Erziromê û piştî ku karubarên wî bi dilê wî nameşin, dixwaze di wê heyamê de mala xwe ji wir bar bike vegere Bazidê. A di wê heyamê de Jaba û Bazidî hevdu nas dikin [4] û di encama vê têkiliyê de gelek berhemên ku îro bingeha klasîkên wêjeya Kurdî pêk tînin ji windabûnê xelas bûne û gihîştine navendên kurdolojiyê.[5]

Heke berhemên Mela Mehmûd bîn dabeşkirin, bi gelemperî ev sernavên sereke derdikevin pêş:



1.Dîrok; Tewarîxî Cedîdî Kurdistan,
Tewarîxî Qedîmî Kurdistan (wergera
Şerefnameyê)

2.Ferheng; Devoka Hekarî-Rewendî,
ferhengên din ên ligel Jaba

3.Rêziman; Rêzimana Teremaxî, Tuhfe
en-Nehlan

4.Wêje; Mem û Zîn, Yûsif û Zuleyxa,
Leyla û Mecnûn, Şêxê Sen'an, Bersîsê
Abid û Qewlê Hespê Reş, Kela Dimdim,
Siyamend û Şemsê, Îskendernameya
Gencewî (ji Farisî werger).

5.Folklor; Berhevoka Şîret û Gotinên Pêşyan, Berîte, Lawij û Kilamên Kurmancî

6.Civaknasî; 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan.[6]

2. Di 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye de Jina Kurd

Bazidî di kitêba xwe de herî zêde li ser mijara jinan disekine û ji gelek hêlan ve qala wan dike, fonksiyon û rola wan a di civakê de derdixe holê, muqayeseya wan bi gelên herêmê û jinên Rojavayî re dike. Bi raya min ji ber wî wêneyê Mela Mehmûd derxistiye holê piştî wî kê der heq jina Kurd de axiviye pir yan hindik ketiye bin tesîra wî.[7]

Lê ev nayê wê meneyê ku bi van şîroveyên xwe ji rastiye dûr ketiye û ev rewş bi ahidiya seyahên li Kurdistanê geriyane jî hatiye piştrastkirin.[8] Wekî ku li jor jî me anî zimên Bazidî ya rast mîna wênekêşekî pîspor wêneya jina Kurd dikêşe. Rewşa wê ya di hundirê malê de, rabûn û rûniştina wê, damenpaqijiya wê, pêşwazîkirina mêvanan de rola wê, di kar û barê malê de çalakbûna wê, di şer û aştîyê de wêrekiya wê û di heman rewşê de di hevaltîya zîlamê xwe de sekna wê û hwd. Yek bi yek digire dest, ji bo dema hingê rave dike û ji bo dema bê jî mîrateyeke bêhempa ji nifşên nû re dihêle. Em ê jî niha ji berhema Mela Mehmûd bi mînakan li ser van xalan rawestin.

2.1. Di Kar û Xebata Malê de Jina Kurd

Wekî ku ji gotinên Mela Mehmûd tê fêmkirin di hundirê malê de xebatkara herî jêhatî, bihuner û li pêş jina Kurd e. Heta mirov dikare bibêje ku hemî pêdiviyê malê jina Kurd bi keda destê xwe û hunera xwe derdixe holê. Mêr têkilî kar û barên malê nabe, ew bi piranî li derve dixebite. Em vê yekê ji van gotinên Bazidî fêm dikin:

" Û jîn, keçêd wan qewî şolker û cesûr û xuyîhuner in. Kulav û berr û xalî û têran çêdikin. Û malêd ku gulam tunînin, hesbke gulamê malê jin in. Her çî şola malê bibe, jîn dikin. Heta hespêd mêrêd xwe xo jî jîn xuyî dikin. Mêr bi geyrê şerî tev şolekî qewî nabin. Bazar û dayin û istandin jî bi jinan dibin. Û tene meclîsê û iqtida bikitin tevî şêwr û umûrê dibin û kerem û îkrama xelqê dikin." [9]

Ji bilî van, jina Kurd xwedî hin taybetmendiyan din e jî. Mînak jina Kurd dikare bibe xwedî sermayeyeke şexsî û di taserufa wê de jî xwedî biryara xwe ye. Ango bi gotineke Kurdî malê xwe birijîne biavêje ew bi qîma dilê xwe ye. Ango em dikarin bibêjin ku ne tenê şuxulkera hundurê malê ye. Bazidî wiha cî dide vê mijarê:

" Wekû dinê jinêd Ekrajan jî malêd wanê bi xo dibin mesela pez û dewar û diraf ku ji malê baban inane weyaxo mêrî dayinê. Ji wî malêd jinan re şikêrt dibêjin. Mêrêd wan tevî wan malêd jinan nabin û naxûn belkû ew jîn pê kirîn û firotinê dikin û zêde dibitin." [10]

2.2. Di Nav Civakê de Rewşa Jina Kurd

Li gor dîtin û vegotina Bazidî jina Kurd di civakê de gelekî serbest e, bi gotineke din jin li civatan rûdinê, tevî şêwr û axaftinan dibe û xwe jî mêran naveşêrin. Bêguman ev mijarana piçekî jî bi şert û merc anga bi awayê jiyana wan ve têkildar e. Digel ku niha jî ev taybetî di nav civaka Kurd de xwe nîşan dide, lêbelê di jiyana bajarvaniyê de hindik jî be guherîn hene.

Bêguman Bazidî di vê mijarê de pirtir balê dikişîne ser jiyana koçeriyê. Jixwe di jiyanekê bi vî rengî de piştperdebûn hema bêje ne mumkin e. Bazidî jî vê hêlê ve wan dişibîne keç û jinên rojavayî [11] û wiha behsa wan dike:

" Waqî'a revîna jinan ji mêran, di nav wan de 'adet nînin. Jîn û keçêd wan ji kes narevin, wekû milletê Efrenciye ew jî serbest in. Lakin bi wê îtîqadê ku xirabiyê nakin, îlla eger yekê ji wan şola xirab kirîn, çare nînin, elbette ewê dikujiñ " [12]



" Û jinêd wan bi xo serbitenê diçine aşî karwanan. Û di malê de eger xanî bibe û eger kon bibe deh û panzde mêr û jîn bab û bira û xo û da û jîn û bûk û zava hemû li nik yekûdu bi cihekî radizên şerm û heya nakin. Lakin eve derûrî ye, lewranê cî tunîne hemû di xanî û konekî da nin, çare nabitin.

Jîn û bûkêd wan esla rûyêd xo ji kesî setir nakin û narevin û digel hemû kesan jî xeber didîn. Lakin dîsanê ehledeb û 'îsmet in"[13]

Em ji van gotinên Bazidî fam dikin ku jina Kurd di nav civakê de gelek azad e, lê ligel vê azadiya xwe xwedan 'îsmet e û damenpaqije.

2.3. Di Dema Şer û Aştiyê de Jina Kurd

Di destpêke wekî ku me anîbû zimên Kurd ji bo wêrekiya jinê di gotina pêşiyar de wiha gotine; " Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e". Belê em vê rastiyê di jinên Kurd de dibînin, lewma Bazidî, balê dikişîne ku jinên Kurd ger hewce bike tevî zilaman li hember neyaran şer dikin, ([14] we ji şer nadin alî. Mela Mehmûd wiha dibêje:

"Û jinêd wan malan jî her yek kon istûnkê digrîn destêd xo û hadir dibin. Guhê jinan jî li şerî ye, dîtî ku şer hate nêzûka malan, ew jîn jî bi wan îstûnkonan diçin şerî û yariya mêran dikin. Dibê jîn jî tene birîndarkirin û kuştin. Yanê wekû şerekî wiha li ser malêd Ekradan biqewimîn, jîn û mêr şerî dikin..."[15]

Çawa ku jin di nav şer û pevçûnê de çalak û wêrek in, em dizanin ku jina Kurd ji bo ku di navbera du komên şerker de fonksiyon rawestandina şer jî hildidin ser milê xwe.

Di nav civaka Kurd de wekî edetê kevnare ye, dema ku du komên mêran şer bikin ji bo ku şer rawestîne jina Kurd çarika xwe ji serê xwe dike û diavêje erdê û bang li wan dike da ku şer rawestînin. Ev tevgera jinê li ba mêrê Kurd jî xwedan qîmetek e û pirê caran guhdariya jinê tê kirin û şer tê rawestandî.

"Ekserî jîn weya mela weya şêx dikevîne nêva wan neyaran û li hevdu tînin, lewranê tayifeyêd Ekradan qewî zêde qedrê mela û şêxan û jinan digrîn. Ew hersê tayife herçî ricaya bikin ewan mayûs nakin. Zaf dibe du tayife li meydana dikine şer û ji herdu kenaran jî telefîyat bûye. Wekû jin bê û laçika xo raxîne nêva wan, elbette ew du tayife ji yekûdu dibin..."[16]

Di nav Kurdan de jin muhterem e û ew jî li gor wê statuya xwe tevdigere û heta di şer de jî zîlam li jinan naxin û ji bo lihevhatinê gava têkeve navberê û herine ricayê xatirê wan digirin.[17]

"Lakin jîn di nav wan de murexes in, ew destê xo li jinan hilnagirîn û 'edawetê digel jinan nakin û qewî zêde xatira jinan çavra dikan. Jîn biçe rica xûnê jî dibexîşînin.'"[18]

2.4. Di Şîn û Şahiyan de Jina Kurd

Mijareke ku Mela Mehmûd bi hûrgilî li ser disekine û teswîra wê ji me re dike jî tevgerên jina Kurd a di dema şîn û şahiyan de ye. Nexasim di şînê de jina Kurd pir derdikeve pêş, lewra jina Kurd li ser xizmê xwe pir dilsoj e bi taybetî ger yê mirî yekî ciwan be hê pirtir li ser diêşe, bi tevgerên xwe yên dilsoj vê yekê nîşan dide.

"Li mewta ciwanan zêde şîn û matem digirîn, libasêd reş werdigrîn û serêd xo reş girê didin. Û jîn û keç û xoh guliyêd xo jê dikan. Qewî zêde matem û şînê dikan eger ew mirî mêr e û xuyîhesp û çek û taxum hespêd wî dixemilînin û çek û sîlahêd wî li ser hespan girê didin, ewan hespan li berayikê cinazeyî dikêşin. Û ew jîn û keç û da û xohêd wî, dilo û lawijk dibêjîn, wey l imin babo, wey l imin bira, wey l imin pismam dibêjîn û digrîn û deng û sedaya bavobavoya wan diçite felekê. Yanê mirofekî biyanî jî rast şîna wan bêtin, elbette dilê wî disoje û digirîn. Bi vî terzî bi ihtîşam dibin çal dikan. Û ew jinêd ku guliyêd xo birrîne, ewan guliyên li ser qebra wî meytî, li kêlêd wî dilawisîn. Heta panzde rojan subeh û êvaran jîn û mêr û cîran têne ziyareta qebra wî dixunin û digirîn, sedeqe û xêran dikan. Ev mirî eger mêr e, libasekî wî beqîmet mesela qapût û kurk weyaxo şalê bibiha davêjine ser cinazeya wî. Û eger jîn e, dîsanê libasekî zîqîmet davêjine ser cinazeyî û dibine qebrê. Ew libasê ku avêtine ser cinazeyî, ew ji boy mela in. Ew dibin dibin û mela difiroşin û li yekûdu parî vedikin.'"[19]



Ya rast piştî vegotina Bazidî êdî pêdivî bi gotine din nemaye. Tenê mirov dikare bibêje ku jina Kurd jineke dilsoj e û di merasima cenazeyan de ew çend dilsoj e ku bi gotina Bazidî dema yekî biyanî jî rastî wê merasimê bibe teqez wê dilê wî jî bişewite û bi wan re bigirî. Nexwe dîsa jina Kurd lehenga sereke ye wekî di gelek mijarên din de jî.

Îca heçî şahî ye, dîsa jina Kurd bi hal û tevgerên xwe yên li gor reng û resma dawetvanekê derdikeve pêş û rola xwe dilîze. Ji bilî vê Bazidî cudahiya di navbera kesên xwedî matem û yên din de çine radixîne ber çavan û vedibêje. Ji bo em nekevin dubareyê û dirêj nekin dîsa emê guh bidine vegotina Mela Mehmûd:

"Lakin ew mirofêd ku hiznî ne ew libasêd sor û qîrmiz û cilêd faxire ber nakin û destêd xo hine nakin û çavêd xo kil nadin û naçine dawetan û kêfxweşîyan. Û li nik wan jinên bî jî şerm e, xo naxemilînin û libasêd sor û qîrmiz wernagirîn û naçine dawet û kêfxweşîyan."[20]

Encam

Me ji vê berhema Mela Mehmûd fam kir ku ew di wêjeya Kurdî ya pexşankî de xwedî cîyekî pir girîng e. Dîsa me fam kir ku jina Kurd din av civakê de ji gelek awayan ve çalak e û xwedî cudahiyeke hêja ye.

Bêguman Mela Mehmûd kedeke hêja daye û ev behrem wekî mîrateyeke hêja ji nifşên nû re hiştiye. Lê divê em di vir de rol û alîkariya hevalê wî A. Jaba jî ji bîr nekin û heqê wî teslîm bikin. Lewra ger Jaba ji bo vê xebatê Bazidî teşwîq nekiribana û rê û rêbazê vê xebatê nîşan nedana wê derketina vê berhemê zor zehmet bana.

Bêguman ji hêla mijara me ve giringiya vê berhemê ev e ku; Mela Mehmûd hema bêje ji pirê mijaran bêtir giringî daye mijara jinê û bi hûrgilî di civakê de, di malê de, di şîn û şahîyan de û di gelek warên din de behsa rola jinê û tevgerên wê kiriye.



Em ji vegotin û ravekirina Bazidî gihîştin vê encamê ku jin ango jina Kurd din av jiyanê de û din av civakê de rola xwe dilîze û her dem çalak e. Jin him dê ye, him xwişk e, him yar e, him heval e, ew ne tenê nesne ye pirê caran em dikarin bibêjin ku kirde ye.

Dîsa me fam kir ku berhema Mela Mehmûd mîna gencîneyekê ye. Di vê gencîneyê de hê gelek mijarên hêja hene ku divê li ser bê rawestan.

NÎŞEJÊR

- [1] Bayezidî, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r. 255
- [2] Pîrbal di berhema xwe ya bi navê Mela Mehmûdê Bayezidî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd, Weşanên Aras, Arbil, 2000
- [3] Murad Celalî, Mela Mehmûdê Bazidî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Nûbihar, Stenbol, 2016, r.77.
- [4] H.b, r. r.81.
- [5] Hassanpour, Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985, r.162.
- [6] Murad Celalî, Mela Mehmûdê Bazidî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Nûbihar, Stenbol, 2016, r.84.
- [7] Nikitin, Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2, r.176,187
- [8] Brant, 1838 Yazında Kürdistan, r.145
- [9] Bayezidî, Puavy i Obyaj Kurdov, r. 98,99.
- [10] H . b . r. 189,190.
- [11] Murad Celalî, Mela Mehmûdê Bazidî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Nûbihar, Stenbol, 2016, r.163
- [12] Bayezidî, Puavy i Obyaj Kurdov, r.190
- [13] H . b . r. 115, 116
- [14] Brant, 1838 Yazında Kürdistan, r. 40
- [15] Bayezidî, Puavy i Obyaj Kurdov, r.192, 193.
- [16] H. b. r. 181, 182.
- [17] Murad Celalî, Mela Mehmûdê Bazidî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Nûbihar, Stenbol, 2016, r. 164
- [18] Bayezidî, Puavy i Obyaj Kurdov, r.175, 176.
- [19] Bayezidî, Puavy i Obyaj Kurdov, r.184, 185, 186.
- [20] H . b . r . 110

- 1.Bayezidî, Mela Mehmûd: Puavy i Obyaj Kurdov, wer. M. B. Rudenko, Moskova, 1963.
- 2.Brant, James: 1838 Yazında Kürdistan, wer. A. Celil Kaya, Weşanên Rûpel, Îstanbul, 2014.
- 3.Celali Murad, Mela Mehmûdê Bazidî û 'Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiye, Nûbihar, Stenbol, 2016.
- 4.Hassanpour, Amir: Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985, wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Avesta, İstanbul, 2005.
- 5.Nikitin, Bazil: Kürtler- Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2, ç. 4., wer. Hüseyin Demirhan- Cemal Süreyya, Deng Yayınları, İstanbul, 1994.
- 6.Pîrbal, Ferhad: Mela Mehmûdê Bayezidî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd, Weşanên Aras, Arbil, 2000.





GİZÊ GAZO - LÎSTIK

Şems Yusuf Derdere

Listîka Gizê Gazo bi şiv û çend listikvanan tê listin.
Listikvan tev topê ser hev dibin û yek ji wan yek bi yek
û kîte bi kîte hevalan dijmêre;

Ji bo keçan:

"E-kil çî-kil, ça la çî-kil. Zo-zan
dî-ne mê-rê wê miş-ko bû ser-sot û şe-wi-tî"

Ji bo lawan:

"E-kil çî-kil, ça la çî-kil. Ba-ran
dî-ne ji-na-wî miş-kê bû ser-sot û şe-wi-tî"

Jimartina dawî li ser kê bisekine ew
dişewite û dikeve holê, li ber holê dimîne û dibe Gizê Gazo

Her listikvan serê şiv an çoyê xwe bi tiliya şahdê pê digire
û binê şivê jî li ser pozê sola xwe dadîne. Lingê xwe li ba
dike heyra ku jê tê davêje dûr. Listikvan şivê çiqas bi dûr
ve bavêje baştir e. Ew kesê di holê de ye, erka wî; wan
şivan topê ser hev bike û bîne holê. Ew kesên di holê de
ye wexta ku here wan şivan tev top ke divê bêhna xwe
negre û bideng bibeje: "Gizê Gazo, Gizê Gazo, Gizê
Gazo..."

Yê li ber holê ku wan şivan bi lez gişk topê ser hev kir, li
gor listikê erka xwe hanî cî, ku neşewite ev kesa jî holê
der dikeve û dora xwe derbas dike. Yan jî BÊHNA xwe
berde û bêhn bigire îja ev kesa dîsa dişewite di holê de
dimîne. Dîsa dibe "Gizê Gazo" li ber holê disekine.

Gotin: Şemsettîn Karaaslan
Dever: Gundê Qerto Çêrmûg-Diyarbakir
Temen: 44
Perwerde: Lîse

TASEK AV

PAŞA AMEDÎ



Bav di ciwantiya xwe de li zarokên xwe pir mêze dikir û ji wan pir hez dikir. Tu car zarokên xwe birçî nedihişt. Bav bi çi awayî be zikê zarokên xwe têr dikir... Rojekî diya zarokan çûbû mala bavê xwe, bav û zarokên xwe tev li mal bûn.

Bav wexta ku tî bû, ji zarokên xwe tasek av xwest, zarokê mezin ji birayê xwe re:

- Here ji bavo re avê bîne? Bira ji birayê ê din re:

- Tu here ji bavo re avê bîne? Ev bira jî ji birayê biçûk re:

- Birayê min tu here ji bavo re tasek avê bîne?

Birayê biçûk li birayên xwe mêze dike û xwe cangiran dike, nedixwest ku here avê ji bavê xwe re bîne, ji bavê xwe re:

- Bavo tu here ava xwe vexwe û ji min re jî tasek avê bîne?

Bav dibîne ku zarokek jê re avê naynin, bav tîbûn û hirsî xwe di kûrahiya dilê xwe de difetîsîne û axîn dikîsîne...

Bavek li heft zarokan mêze dike lê heft zarok nikarin li bavê xwe mêze bikin

Gotina Pêşîyan

**BAVEK LI HEFT
ZAROKAN MÊZE DIKE
LÊ HEFT ZAROK
NIKARIN LI BAVÊ XWE
MÊZE BIKIN**

GOTINA PÊŞIYAN

Firat BAWERÎ



CEJNA ROJA ZIMANÊ KURDÎ PÎROZ BE

15ê Gulanê Sala 2020an



**WWW.CANDNAME.COM
E-KOVARA ÇANDNAMEYÊ**